


kulîlk

kovara zarokan - kurdiska barntidning



sal: 1997

hejmar: 51

KULÎLK

kovara zarokan - kurdisk barntidning

XWEDÎ	Mala Kultura Kurdî & Jîna Nû
REDAKTOR	Zinar Soran
REDAKSIYON	H. Balta L. Polat M. Dehsiwar M. Lewendî
ABONETIYA SALÊ	Şexs 150 SEK Institution 200 SEK Hejmarek 20 SEK <i>Ji bo welatên din mesrefa postê lê zêde dibe.</i>
ÎLAN	Rûpelek 500 SEK Nîv rûpel 250 SEK
POSTGIRO	503799-9
ISSN	0282-700X
ADRES	KULÎLK Box: 152 16 161 15 Bromma/ Sweden
TEL/ FAX	46-8-8031357/ 8-801825

Hejmara pêşî ya Kulîlkê di sala 1980-yî de hatiye weşandin.

sal: 1997



hejmar: 51

Heval û hogirên hêja!

Em dizanin ku dibistan vebûne. Hinek ji we niha diherin dibistanê û dest bi dersan kirine. Lê li Kurdistanê bi hezaran zarok hene, ku nikarin herin dibistanê. Dewletên ku welatê me xistine bin destên xwe, nahêlin kurd dibistanên xwe vekin û zarokên kurdan bi zimanê diya xwe bixwînin û binivîsin. Zarokên kurdan neçar dimînin, ku bi erebî, farisî û tirkî bixwînin.

Ji bo ku niha li gelek navçeyên Kurdistanê şer heye û gelek gundên kurdan hatine şewitandin, bi hezaran zarok ji wan dibistanên kolonyalîstan jî bêpar mane.

1ê îlonê *Roja Aştîyê* ye. Aştîxwazên dinyê her sal di vê rojê de, li dijî şer dengên xwe bilind dikin. Ew dixwazin hemû millet û gel weke bira bijîn. Lê dewlet û hêzên xwînxwar û kolonyalîst vê yekê naxwazin. Ew ji şer û pevçûnê feydê dibînin. Loma jî ew li dijî çalakiyên aştîxwazan derdikevin.

Zarokên kurdan ji bendestî, şer û zilma dewletên kolonyalîst bêzar bûne. Ew jî weke zarokên neteweyên din dixwazin serbest û azad bijîn. Di nav aştîyê de bijîn. Bi zimanê bav û bapêrîn xwe bixwînin û binivîsin.

Lê heta ev roj vere, divê zarokên kurdan bi hemû hêz û îmkanên xwe hewl bidin ku bi zimanê xwe yê şêrîn bixwînin, binivîsin û bifikirin...

Ji bo vê wezîfe û armanca pîroz, kovara we *Kulîlk* wê hertim bi we re be.

Heta hejmareke din, hemû şahî û xweşiyên ku hene yên we bin.

KULÎLK

JİYANA FERÎD

(2)

Di warê zimanê swêdî de Ferîd hê jî zahmetî dikişand. Wî di sinifê de zêde cesaret nedikir ku destên xwe bilind bike û bipeyive. Piştî demekê hevalên Peter yên nû çebûn. Ev dibû sedemê ku Peter roj bi roj ji Ferîd dûr bikeve û nêzîkî hevalên xwe yên swêdî bibe. Vê rewşê Ferîd xemgîn dikir. Gava Ferîd didît ku zarokên din bi hevdu re dipeyivin, di-kenin û dilîzin, ew bêtir bi biyantiya xwe dihisiya. Wê gavê jiyana gund û hevalên wî dihat bîra wî û xweziya xwe bi wan rojan dianî.



Ferîd her ku çû bêtir kete qalikê xwe. Ew bûbû zarokêkî bêdeng û bi tenê. Rewşa Ferîd ya dibistanê tesîr li ser pêwendiyên wî û malbata wî jî dikir. Diya Ferîd didît ku roj bi roj lawê wê tê guhertin, bêdeng dibe û xwarina wî jî kêmtir dibe. Rewşa Ferîd diya wî gelekî xemgîn dikir. Teva ku çend caran diya wî jê dipirsî jî Ferîd derdê xwe nedigot.

Evarekê, diya Ferîd rewşa Ferîd ji bavê wî re got. Bavê Ferîd jî xwest ku derdê kurê xwe fêhm bike. Çend caran bi Ferîd re peyivî, lê tu bersîveke zelal jê negirt. Bavê Ferîd biryar da ku here dibistanê û bi mamosteya wî re bipeyive.

Piştî demekê Ferîd bêtir êlma xwe da ser dersên xwe. Ew gihast wê baweriyê ku divê dersên wî gelekî baş bin. Ancax



bi vî awayî ew bikaribe bala hevalên xwe yên sinifê bikişîne ser xwe û wan bi xwe bide hez kirin. Pêşî giranî da ser dersên matematîk û wêneyan. Piştî demekê wî di sinifê de, di herdu dersan de serî dikişand. Gelek hevalên wî di dersa matematîkê de alîkarî jê dixwastin. Ev dibû sedemê ku pêwendiyên navbêna wî û gelek hevalên wî yên sinifê hê germtir bibin.



Êdî baweriya Ferîd bêtir bi wî dihat. Wî hewl dida ku dersên xwe yên din jî pêş ve bibe. Piştî çend salan, Ferîd bû yek ji wan şagirtên ku herî jîr û serketî. Dersên Ferîd gelekî baş diçûn. Di warê ziman de jî problemên wî nemabûn. Gelek hevalên wî jî çêbûbûn; lê dîsa jî wî her xwe xerîb û biyanî hîs dikir. Ew di nav du çandeyan de diçû û dihat. Li malê jî hinek xwestek û daxwazên wî roj bi roj ji yên malbatê bi dûr diketin. Ev rewşa, car caran li malê dibû sedemên hinek nakokî û pirsgirêkan. Demekê Ferîd xwest ku dev ji dersa kurdî berde. Lê dê û bavê Ferîd pêwîstî û girîngiya zimanê zikmakî bi sebir jê re gotin. Piştî demekê Ferîd bi xwe jî gihast wê baweriyê ku divê ew herdu kulturên bi hevdu re bidomîne...

Rojekê mudûrê dibistanê gazî Ferîd kir. Ferîd û çend şagirtên din ji bo civîneke ciwanan hatibûn hilibijartin. Civîn li zanîngeha Biskops-Arnö çêdibû. Civîneke navneteweyî bû. Ji gelek welatan şagirt beşdarî civînê bûbûn. Her şagirtî li ser welatê xwe agahdarî dida. Dor hatibû ser Ferîd. Ferîd pêşî hinekî li ser rewşa Kurdistanê û kurdan rawestiya û paşê behsa zaroktiya xwe ya gund kir. Zarokên din mit û mat mabûn. Her kesî bi dîqat lê guhdarî dikir. Agahdariyên Ferîd ji wan re gelekî balkêş bûn. Gava Ferîd axaftina xwe qedand, hemûyan demeke dirêj jê re li çepikan xistin. Hêsir ketibûn çavên Ferîd. Êdî baweriya Ferîd bêtir bi wî dihat. Wî bêtir xwe nas dikir. Jiyan jî bo wî gelekî xweştir û bi mane bûbû...

Nivîs: Zinar Soran û Mihemed Dehsiwar

Wêne: Berit Marit Heatta û Kerttu Vuolab

BÊJEYÊN NÛ

Li deftera xwe binivîsin!

malbat: dê, bav, xweh û bira.

jiyan: heyat

baxçe: cihê dar û fêkî lê hatine çandin.

xemilandin: bi tiştan xweşik kirin.

bûyer: hedîse, bûyina tişteki.

şikeft: li çiyê cihên weke oda û ji ber xwe çêbûne..

tengasî: zahmetî.

pêwendî: têkilî, dan û stendin.

beşdarî: ketina nav tişteki, îştirak.

nivîn: doşek, lihêf û balêf yên ji bo razanê.

kinc: cil; pantolon, çakêt, êlek, qutuk, fistan û hwd.

şagirt: kesên diherin dibistanê û dixwînin.

hewş: pêşî ya jî paşayiya xaniyan.

biyanî: xerîb.

xewn: gava mirov di xewê de tişteki dibîne.

rewş: hal, dirûm.

qalik: qalikê pîvazê, qalikê zebeş, qalikê gwîza û hwd.

xemgîn: bê kêf, li ber ketî.

bawerî: îman, ewle.

kur: law, pis.

wêne: resim.

çand: kultur.

zimanê zikmakî: zimanê dê, zimanê bav û kalan.


agahdarî: înfomasiyon.

SPARTIN

Bêjeyên nû di van hevokan de bi cih bikin!

- 1) Divê zarok bi bixwînin û binivîsin.
- 2) Evîn ji xwe pir hez dike.
- 3) Baxçê me bi gul û çîçekan ye.
- 4) Mamoste ji re got, navê te çi ye?
- 5) Zivistanan mirov qalind li xwe dike.
- 6) Ez bi şev di nav de radizêm.
- 7) Ji bo ku pîrka min nexweş e, ez im.
- 8) Şagirtên dibistanê civîne bûn.
- 9) Du keç û du xaltîka Dilşa hene.
- 10) Ez pir xweş dizanim çêbikim.
- 11) Gava perê mirov namîne, mirov dikeve
- 12) min û mamosteyê min gelekî xweş in.
- 13) Televizyon her roj nû dide.
- 14) Her neteweyek wî heye.
- 15) Min îşev di de, kalkê xwe dît.
- 16) Kesên mirî ne li ne.
- 17) Ez xwe bi hevalê xwe tînim.
- 18) Şivan, zivistanan pez dixin
- 19) Di nav de sêv, hirmî û hinar hene.
- 20) xaniyê me pir mezin e.
- 21) Kesên ji welatê xwe bar dikin, ne.
- 22) Pîra Xatûnê nexweş e û wê îro xerabtir bû.
- 23) Divê em Helebçeyê tucar ji bîr nekin.
- 24) porteqalan biqêşêrin û bixwin!

MIJÛLÎ




Tenê bi guherandina cihên du darikan, hûn dikarin heşt malikên çargoşe çêbikin?

ŞÊR Û MIŞK

Hebû tunebû, şerek hebû. Şêr rojekê ji çolê vedigere lana xwe. Dinêre ku mişkeke piçûk di lana wî de ye. Mişk wexta ku şêr dibîne ji tirsê dilerize. Lê şêr dest nade mişkê û jê re dibêje:

-Metirse, ez te naxwim!



Kêfa mişkê tê, sipasî şêr dike û ji wir diçe. Piştî çend rojan, şêr dikeve nav tora nêçîrvanekî. Dike nake nikare xwe xelas ke. Mişka ku şêr dest nadabûyê û azad kiribû, tê cem şêr û jê re dibêje:

-Mîrê min ger tu rê bidî ezê alîkarîya te bikim. Ezê torê bibirim, te ji vî halî xelas bikim?

Şêr dibêje:

-Na sipas, ez alîkarîyê naxwazim, hêza min heye, ezê bi xwe torê bibirim û xwe xelas kim!

Lê şêr dike nake nikare torê bibire.

Mişk dîsa jê re dibêje:

-Mîrê min tu rê bidî, ezê torê bi diranên xwe bibirim.

Şêr naçar dimîne, alîkarîya mişkê qebûl dike. Mişk bi diranên xwe yên tûj torê dibire, şêr ji nav torê xelas dike. Şêr gelek sipasî mişkê dike û dibêje:

-Hêz ne di mezinî û biçûkîyê de ye, lê di hiş de ye.

lan: ciyê heywanên kovi, mala wan
tu rê bidî: tu destûrê bidî
dest nade: têkil nabe, qariş nabe
naçar dimîne: mecbûr dimîne

Amadekar: M. Lewendî

LÊ BIGERIN Û BIBÛNIN!



Di vê qesrê de kovikeke bestenî/ dondirmê, miqarekî xeratiyê,
rakêtek, kilêtek û pirtûkek hatiye veşartin. Hûn dikarin wan bibînin?


Mizgîn

û

Lezgîn

Mamoste





ÇEND PIRS LI SER MIŞKAN




1. Navê cihê ku mişk lê dimîne çi ye?
2. Mişk divê herî pir ji kîjan heywanî xwe piparêze?
3. Mişk bi şev dikare “bêpêjin” yanî pir bêdeng bigerin.
Gelo tu heywan heye ku gava mişk bi şev digerin, wan bibîne û bigre?
4. Hûn dikarin dûrikekê li ser mişkan binivîsin?

RASTNIVÎSÎNA JIMARAN

0	Sifir	30	Sî û yek
1	Yek	40	Çil
2	Du, dido	50	Pêncî
3	Sê, sisê	60	Şêst
4	Çar	70	Heftê
5	Pênc	80	Heştê
6	Şeş	90	Nod
7	Heft	100	Sed
8	Heşt	101	Sed û yek
9	Neh	200	Dused
10	Deh	300	Sêsed
11	Yazdeh	400	Çarsed
12	Dozdeh	500	Pêncsed
13	Sêzdeh		
14	Çardeh		
15	Pazdeh	1000	Hezar
16	Şazdeh	1000 000	Milyon
17	Hevdeh	1000 000 000	Milyar
18	Hêjdeh	1000 milyar:	Trilyon
19	Nozdeh		
20	Bîst		
21	Bîst û yek		

MIJÛLÎ



Di nav herdu wêneyan de 7 tişt hene ku weke hevdu ne. Ma hûn dikarin wan bibînin?

VÎNDA Û LORÎN

Gelî mindalên delal
Guh bidine mam û xal

Sehkin li vê çîrokê
Şengê, pengê gilokê

Vînda xuşka Lorîn e
Wek bihokê bi bîhn e

Du xwençe dipişkivin
Dar malê lê dicivin

Dayika wan Rojîn e
Bav Ferhadê şêrîn e


Herdû jî xwende jîr in
Di kurdiyê de pîr in

Vînda xwendake kurd e
Bi kurdî jîr û rind e

Sîh û yek tîp ji ber in
Her dem pirtûk li ber in

Bi zimanê dê û bav
Di axifê herdem gav

Û xuşka xwe Lorîn naz
Fêr dike ta dikin raz



Bav ji çîroka Şengê
Geh Kêzhatûn û Pengê

Ew ji wan re dibêje
Zivistan şev dirêj e

Sibeha zû radibin
Li dorên xwe vedigerin

Dêm û dirana dişon
Li xwe dikin pantelon

Li ser masê dicivin
Bi hev re taştê dixwin

Ji nû davêjin mila
Baholê pirtûk-cila

Maç dikin destê bavê
Li wan dikin silavê


Rê digrin dibistan
Herdu keçên Kurdistan

Çîroka min ji wer xweş
Ji apê we Konê Reş



(Ji pirtûka Konê Reş ya bi navê Şagirtê Bedir-Xan im.)

NAVÊ VAN HÊŞÎNAHIYAN BÎNIVÎSÎN!



.....



.....



.....



.....



.....



.....

ZIMAN Û GRAMER

Amadekar: Zinar Soran

MÊJER

Mêjer, yekane û piraneya navdêran nîşan dike.

Yekane:

Gava navdêr yekane be, ew mirovekî, heywanekî an jî tiştkekî nîşan dide.

Mînak:

- 1) Mamoste îro nehat dibistanê.
- 2) Dibistana me dûr e.
- 3) Ez keweke spî dibînim.

Di van hevokan de, tenê behsa *mamosteyekî, dibistanekê û kevokekê* tê kirin.

Pirane:

Gava navdêr pirane be, ew ji yekî zedetir mirovan, heywanan û tiştan nîşan dide.

Mînak:

- 1) Mamoste îro hatin.
- 2) Dibistanên bajêr ji yê gundan mezintir in.
- 3) Kevokên Serdar yê teqlê ne.

Di van hevokan de, behsa ji yekî bêtir *mamosteyan, dibistanan* û *kevokan* tê kirin.

Yekane û piraneya navdêran bi gelek awayan têne xuya kirin. Weke mînak:

Yekane

Ev kevir e.

Ez kevokê dibînim.

Tu vê pirtûkê dibînî?

Pirane

Ev kevir in.

Ez kevokan dibînim.

Tu van pirtûkan dibînî?

LÊKER

Lêker, ew bêje ye, ku tevger ya jî rewşekê dide diyar kirin. Lêker bi piranî dikeve paşiya hevokê.

Mînak:

- 1) Alan pirtûka xwe dixwîne.
- 2) Sîpan bi gogê dilîze.
- 3) Evîn kirasê bûka xwe lêdike.

Di van hevokan de, bêjeyên dixwîne, dilîze, lêdike, lêker in.

HOKER

Hoker, ew bêje ye ku di warê dem, hejmar, cih û rewşê de maneya lêker û rengdêrê dibe serî.

Mînak:

- 1) Lezgîn zû direve.
- 2) Havînên Kurdistanê pir germ in.
- 3) Azad du roj in, ku li vir dimîne.

Di van hevokan de, bêjeyên zû, pir, li vir, hoker in.

BÊJE Û HEVOK

Ji van bêjeyan hevokan saz bikin!

vebûn Dibistana îro
gund

1) Dibistana gund îro vebû.

alîkariya dike Mizgîn
malê

2)

apê Misto li Zîpikê
zadê xist

3)

li Zarok hewşa dilîzin
dibistanê

4)

Mêvanên hatin Sosinê
metka do

5)

ji bû xwediye Hat
newalê malê

6)

Roza kirîye diyariyek
ji xwe diya re

7)

şagirtên Mamoste pir
dikin hez ji xwe

8)

bavê Navê Rustem e
min

9)

TİŞTEKÎ MİN HEYE - TİŞTANOK

1) Tişteki min heye
Ji şekir şerîntir e
Ji hesin girantir e.
Ew çi ye?

Bersîv:

2) Tişteki min heye
Pîrek li hundir
Porê wê li der
Ew çi ye?

Bersîv:

3) Tişteki min heye
Binî ax e
Orte şax e
Serî zêr e
Ew çi ye?

Bersîv:

HÛN PÊ DİZANÏN?

Amadekar: Bavê Hêvî

PIRS 1:

Sê zarokên Rizgo hene. Rizgo diyariyên serê salê amade dike. Sê pakêtan, li kaxetên zer, spî û sor yê zêrikî dipêçe. Lê hersê diyariyên zarokan di pakêtekê de vedişêre. Rizgo ji zarokan re dibêje:

-Li ser pakêtekê du tiştên rast, li ser yekê du tiştên şaş û li ser yekê jî tiştêkî rast û tiştêkî şaş hatiye nivîsandin. Ya ku du şaşî li ser hatiye nivîsandin, diyarî di wê de ne.



Li ser pakêta zer ev hatiye nivîsandin: “Diyarî di vê pakêtê de tunene. Ew di pakêta spî de ne”.

Li ser pakêta spî ev hatiye nivîsandin: “Diyarî ne di pakêta spî de ne; ew di pakêta sor de ne.


Li ser pakêta sor jî ev hatiye nivîsandin: “Diyarê ne di vê pakêtê de ne; ew di pakêta zer de ne”.

Gelo hûn dizanin diyarî di kîjan pakêtê de ne?

PIRS 2:

Mîrze dihere ber deriyê malekê. Sê odayên wê malê hene. Li her odayê jî lampeke heye. Li kêleka deriyê derve sê qumçokên lampeyan hene. Divê Mîrze pê derxîne, ku ew qumçok ên lampên kîjan odeyan in.

Gelo Mîrze çawa wê pê derxîne, ku bê kîjan qumçok yê kîjan lampeyê ye?



PIRS 3:



Di laşê mirov de çiqas hestî hene?

PIRS 4:

Gelo çermê mirovekî li derdora çend kîloyan e?

Bersîvên pirsan di rûpela 31ê de ne!

NAVÊ VAN HEYWANAN BÎNÎVÎSÎN!



DÛRİKËN ZAROKAN

Amadekar: Zinar Soran

1)

Aşvanî têye ji aşê Qezêye
Kera xwe girêda, bi koka darêye

Aşvanî têye ji aşê Diyarbekir
Kera xwe girêda, bi sindoqa şekir

Aşvanî têye ji aşê Mêrdînê
Kera xwe girêda, bi qulpa misînê.



2)

Ew kî ye li ber derî ye, hêva tavê
Sê hibrî li serî ye, hêva tavê
Hersê jî ecemî ye, hêva tavê

3)

Çitik e, ser mitik e, axê delal
Tu bi zincîr û saet e, axê delal
Ew kî ye ji wê de têye, axê delal
Ba li bêrikê dixîne, axê delal
Koma çerxa dirjîne, axê delal.

BIJMÊRIN Û BINIVÎSIN



BERSÎVÊN PÎRSAN

Bersîv 1: Diyarî di pakêta sor de ne. Li ser pakêta zer rastî û şaşîyek; li ser pakêta spî du rastî û li ser pakêta sor jî du şaşî hatine nivîsandin.

Bersîv 2: Mîrze pêl qumçokekê dike û çend deqeyan dimîne û dû re wê vedimrîne. Piştî wê, pêk qumçokek din dike û dikeve hundur.

Lampa odayekê ji xwe vêketîye. Ew dest lampên din dide, yek ji wan sar e û yek jî hê hinekî germ e. Ya garm ya qumçoka pêşîn ku pêlêkiribû. Ya sar ya ku dest nedabûye ye.

Bersîv 3: Di laşê mirov de, li derdora 206 hestî hene.

Bersîv 4: Cernê mirovekî li derdora 2 m² û giraniya wî li derdora 10 kg ye.

Bersîvên Tiştanokan:

- 1) Xew
- 2) Sobe
- 3) Genim

PÊKENÎN

Amadekar: Lokman Polat

ARD Û WERÎS

Cîranekî Melê ji wî werîs dixwaze. Mele naxwaze werîs bide wî. Lê naxwaze ku bibêje “Ez nadim.” Mele dibêje: “Ka ez binerim” û dihere hundur. Piştî demekê vedigere û ji cîranê xwe re weha dibêje:

-Bibûre cîran. Yên me ard li ser ben raxistine.





Ji bo ku Mele cîranê xwe dixwe şûna kêmaqilan, cîranê wî gelekî hêrs dibe û dibêje:

-Mela, Mela! Ma tu kê dixapîne. Ma qet mirov ard li ser werîs radixîne?!

Mele weha bersîv dide:

-Çima mirov ranaxîne? Gava mirov nexwaze bide, ard li ser werîs tê raxistin.

X A Ç E P İ R S



HÛN PÊ DIZANIN?

Amadekar: Heqî Xoce

1) We qet bihîstibû ku navê gundekî tenê bi yek herfê ye?

2) Gelo hûn dizanin, li dinyê tiştê herî pir tê kirin çi ye?

3) Gelo hûn dizanin, ku bê çend kesan formula *Coca-Colayê* dizanibûn û niha çend kes dizanin?

Bersîv:

1) Li Norveçê navê gundekî “A” ye.
Li Fransayê navê gundekî “I” ye û navê gundekî din jî “Y” ye.

2) Li dinyê tiştê herî pir tê kirin **banzîn** e.

3) Tenê heft kesan formula *Coca-Colayê* dizanibûn; lê îro tenê du kes vê formulê dizanin.



ŞIVAN RA

Şivano doş dibîy best û diyaran
Nabînîy qe ruyê derd û xedaran
Şa dibîy tu her gav bi berx û karan
Ji wan berxan yek jî ez bûma xwezî

Şuştî te dilê xwe ji tevîne
Kiş dikîy kerîyê xwe çaxa şevîne
Tu dibîy hevalê dil û evîne
Ji hevalan yek jî ez bûma xwezî

Pif dikîy bilûrê di şevên tarî
Çi dibêy wan ra bi kîjan zarî?
Kom dibin dora te dikin gudarî
Ji guhdara yek jî ez bûma xwezî

KEMAL BADILLI

zarkha bi zanista we biwariya i biwariya

KULÎLK

kurdîska elavariya baratidîning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal: 1997

hejmar: 1



kovara zarokan - kurdîska baratidîning



sal: 1997

hejmar: 18



kovara zarokan - kurdîska baratidîning



sal: 1997

hejmar: 19



kovara zarokan - kurdîska baratidîning



sal: 1997

hejmar: 50